## BAHMAN GHOBADÎ LI CANNES'Ê ELEQEYEKE MEZIN DÎT

# Hesp, kûsî û niha jî pisîk...

**Derhênerê kurd Bahman Ghobadî îcar jî pisîkên Îranê kirine mijara fîlmê xwe. Fîlm di çarçoveya 62'emîn Mîhrîcana Fîlman a Navneteweyî ya Cannesê de hat nîşandan û rastî eleqeyeke mezin hat**



DERHÊNERÊ kurd Bahman Ghobadî îcar jî pisîkên Îranê kirin mijara fîlmê xwe. Film di çarçoveya 62'emîn Mîhrîcana Fîlman a Navneteweyî ya Cannesê de hat nîşandan û rastî eleqeyeke mezin hat. Hate diyarkirin ku gelek aktorên navdar eleqe nîşanî Ghobadî daye.

GHOBADÎ vê carê jî mijareke pir balkêş hilbijart. Eleqeya Ghobadî ya ji bo sewalan didome û wan dike hêmaya fîlmên xwe. Beriya niha hesp û kûsî niha jî pisîk. Di fîlmê xwe de drama ciwanên ku li Tehranê dijîn û muzîkê rockê dikin bi awayekî mîzahî vegotiye... RÛPEL - 6

# Pêkutî bi grevan tên şermezarkirin

**Bi armanca şermezarkirina operasyona li dijî DTP'ê ku di encamê de 3 cîgirên hevserok û 53 kes hatin girtin li Erzincan, navçeyên Darahênê, Erxenî, Dîcle, Farqîn, Bismil, Lice yên Amedê û navçeya Misircê ya Sêrtê çalakiyên greva birçîbûnê dest pê kirin. Bi van çalakiyan tê xwestin ku siyasetmedarên DTP'î yên piştî hilbijartinê hatine girtin, bên berdan. Grevên birçîbûnê dê 2 rojan bidomin...** RÛPEL - 4



HAWAR
Rojnameya Rojane
17 Gulan 2009
Yekşem
Sal: 1
Hejmar: 12
Buha: 50 Kr

## Jin nobetê digirin

Bi pêşengiya parlamenterên jin ên DTP'ê li hemberî cinayetên 'namûsê', hemû cureyên şîdeta li dijî jinê di çarçeveya kampanyaya "Em ne namûsa tu kesî ne, namûsa me azadiya me ye" de sibê li navçeya Dêrikê ya Mêrdînê dê konê nobetê bê vedan... RÛPEL - 7

# 'Bila hikûmet gavên berbiçav bavêje'

54 komeleyên çandê, sendîkayên memûr û karkeran, rêxistinên jinan, komele û saziyên sivîl û odeyên pîşeyî daxuyaniyeke hevbeş dan. Sazî û dezgehên li Amedê xwest ku Hikûmeta AKP'ê ji bo çareseriya pirsgirêka kurd demildest gavên berbiçav bavêje. Çavkaniyên siyasî yên PKK'ê jî dibêjin bi her awayî muxatabên pirsgirêka kurd diyar in




### Li Sêrtê nobeta demokrasî û aştiyê

*Li Sêrtê ji aliyê Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) ve çalakiyeke balkêş hate destpêkirin. Bi piştgiriya Platforma Demokrasiyê ya Sêrtê ji bo protestokirina zext û pêkûtiyên ku di dema dawî de li ser saziyên demokratîk tê meşandin, daxwazkirina çareseriya pirsgirêka kurd bi riyên demokratîk û aştiyane biryara şeveké 'Nobeta Aştî û Demokrasiyê' hate girtin.*

### 'EV REWŞA DAWÎ BO TIRKIYEYÊ ŞANSEKÎ MEZIN E'

Şaxa Sendîkaya Kedkarên Gelemperî yên Maden, Sanayî û Enerjiyê (ESM) ya Amedê ji bo çareseriya pirsgirêka kurd li Amedê bi 54 saziyên demokratîk re deklerasyoneke hevbeş amade kir û li Cemiyeta Rojnamegeran a Başûrêrojhilat bi raya giştî re parve kir. Serokê Şaxa ESM'ê ya Amedê Yakup Keskîn got ku rewşa bê şer ji bo aştiya li Tirkiyeyê hêviyek e.

### 'BILA LI MECLISÊ XEBATA AŞTIYÊ BÊ MEŞANDIN'

Keskîn, weke nûnerên rêxistinên demokratîk nêrînên xwe yên ji bo aştiyê wiha gotin: "Şansek ji bo aştiyê bê dayîn û rewşa bêşeriyê bidome em daxwaz dikin ku hikûmet gavekê biavêje. Her wiha ji bo piştî 1'ê hezîranê rewşa bêpevçûnê mayînde bibe gavên demokratîk bêne avêtin û di bin banê Makeqanûnê de bê misogerkirin. Em daxwaz dikin ku li TBMM'ê xebat bêne meşandin."... RÛPEL - 4

## 'Muxatabên aliyê kurd aşkera û diyar in'

Li gorî çavdêrên siyasî ji bo çareseriya pirsgirêka kurd muxatabên aliyê kurd diyar in. Çavkaniyên nêzî PKK'ê wiha dibêjin: "Divê îradeya gelê kurd bê qebûlkirin. Pirsgirêk bi muxataban re tê çareserkirin. Muxatabên pirsgirêkê li holê ne. Lîderê PKK'ê Abdulllah Ocalan e, PKK ye, DTP ye, heke ev jî nabin mirovên aqilmend in. Yanî aliyê kurd di vê mijarê de zelal e. Divê dewleta Tirk van alternatîfan qebûl bike û gavan biavêje." Her wiha çavdêrên siyasî radigihînin ku Serokomar Abdullah Gul behsa fersendekê dike, lê hikûmet bêdeng e, operasyon berdewam dikin.



### Li Diyadînê hovîtiya nedîtî

Li Diyadîna Agiriyê Yildiz Akkuş (23) bi îdiaya ku têkiliya wê bi yek din re heye guh û difina wê hate jêkirin û hate şişkirin. Ajokarê mînîbûsê dayika 3 zarokan Yildiz Akkuş li eraziyê wê birîndar dît û rakire nexweşxaneyê. Derket holê ku malbata Akkuş bi îdiaya têkiliya Yildiz Akkuş bi yekî din re heye, biryara kuştina wê daye û lewre guh û pozê wê hate jêkirin û ew avêtin navbera gundên Boyalan û Taşkesenê.




### Windayan bibînin ji şermê xilas bibin


Dayikên Şemiyê ku ji bo aqûbeta xizmên xwe yên winda hîn bibin ev cara 216'emîn e çalakiya rûniştinê pêk tînin, banga,"Berê xwe bidin windayan û ji vê şermê xilas bibin" li hikûmetê kir. Dayikên Şemiyê ji bo pirskirina aqûbeta kesên winda cara 216'emîn li Qada Galatasarayê çalakiya rûniştinê li dar xistin. Dayikên Şemiyê vê hefteyê ji bo Hasan Ocak û Ridvan Karakoç rûniştin. Dayikan qurnefîl û wêneyên windayan rakirin... RÛPEL - 3

www.arsivakurdi.org

# Beriya Qasr-i Şirînê piştî Qesr-i Şirînê û Lozan

Piştî peymana Qesr-i Şirîn Kurdistan bû du parçe. Ji serdema 10'an heta serdema 20'an hezar salan me paletiya umetê kir û birayên 'misilman' dek û dolabên xwe li hemberî me gerandin. Bi peymana Lozanê ya ku di 1924'ê de hate îmzekirin vê carê Kurdistan bi destê Rojava û Tirkiyeyê bû çar parçe

**ADIL ZOZANÎ**




Sosyolojiya me kurdan; heke rojekê rêkûpêk bê nivîsîn, dê sedemên bindestbûna me jî derbikevin holê. Ji serdema 10'an heta ku şirîkatiya kurdan û osmaniyan destpêkirî qonaxek e. Heta Peymana Qesr-i Şirînê qonaxa duyemîn û ji Qesr-i Şirînê heta Lozanê jî qonaxa sêyemîn e. Îro hêviya çareseriyê û vegera seriya 360'an em ketine qonaxa çaremîn.

Civaknas û dîrokzanên me yên ku dê xebatê li ser vê mijarê bikin, qalmecal in ku sedsala 10'an ji bo xwe bikin yek ji duryanên esasî yên lêkolînên xwe. Lewre ev serdem ji bo me kurdan şirîkatiya 'umetê' vedibêje. Yekemîn car me kurdan di vê dîrokê de bi serkêşiya eşîreta Rawadî îktîdara umetê girtiye ser xwe.

Malbata Selahedînê Eyûbî di vê serdemê de şirîkatî bi Xelîfeyê Fatimî re kiriye. Kurdistan di vê serdemê de ji bo Rojhilata Navîn bûye kozika parastinê. Di vê serdema ku malbateke kurd serkêşiya Rojhilata Navîn dikir de, li Mezopotamya Jorîn jî yek ji cerebeyên dewletbûnê dihate jiyîn. Dewleta Sedatî ya kurd ku li Farqînê hatibû damezrandin, cerebeyeke din a îktîdarbûnê bû. Dewleta Merwaniyan jî ji aliyê Bad ve li Xarpêtê di sala 981'ê de hatibû damezrandin û piştî ku Bad di encama şerekî bi Hamdaniyan re hate kuştin, kurê wî li ser kursiya wî rûnişt û navê dewleta xwe ji bavê xwe re bexşand. Sînorên dewleta Merwaniyan ji Colemêrgê heta ber qontarên Cûdî, Mûş û Heskîf girtibûn nav xwe.

Di serdema Merwaniyan de pêşketineke xurt a aborî pêk hatibû. Bi tenê li Farqînê sê coyên avê hatibûn çêkirin û ji van coyan av li tevahiya bajar hatibû belavkirin. Amed û Farqîn bûne wargehên bingehîn ên bazirgahiyê û her wiha di vê serdemê de girîngî dane xebatên çandî û edebî jî. Li gorî vebêjerên dîrokê Melikşah çavnebarî li vê dewlemendiyê kiribû û ji Nasiruldewle xwest ku dewlemendiya heyî parve bikin. Lê Nasiruldewle ev pêşniyar red kiriye. Melikşah ji ber hindê bi ser Farqînê de girtiye û bûye serwerê bajêr. Ji ber ku vekolana dîrokê heta niha bala me kurdan tam nekişandiye, agahiyên dîrokî yên vê serdemê tam zelal nîn in. Lê bi qasî ku me kariye dîroka xwe ya vê serdemê ji nav ya serdestên welatê xwe vewejêrin, em dibînin ku ji serdema 10'an heta dawiya serdema 12'an cerebeyên me yên ji bo îktîdarbûnê pêk hatine.



Ligel hatina Osmaniyan a Anatolîayê û şirîkatiya me ya bi wan re, me kurdan rûyê rojê nedîtiye. Balkêş e ku Rojhilata Navîn di hemû pêvajoyên krîtîk de bi serkêşiya pêşiyên kurdan li hemberî hêzên Rojava li ber xwe daye. Lê dema mijara xweserbûna me hatibe rojevê, aliyê hatiye xapandin em kurd in. Ligel paradîgmaya umetparêziyê mafên jigelbûnê pêk tên ên gelê me kurdan hatine qurbanîkirin. Ji serdema 10'an heta, 17'ê gulana li ser xaka Kurdistanê çi qewimiye divê baş bê vekolîn. Şirîkatiya bi Osmaniyan re ji bo me kurdan bûye sedemê windahiyeke çawa divê baş bê fêmkirin. Hin pirs hene ku dîroknas bersiva wan peyde bikin. Yek ji wan pirsan ew e ku kîjan taybetiyên kurdan û osmaniyan ew ber bi hev re birine? Ji daneyên dîrokî yên hatine ragihandin, taybetiyeke esasî ew e ku, serkêşên qewmî malbatî bûn. Osmanî wekî qebîle hatin Anatolîayê û wekî qebîle şirîkatî bi qebîleyên kurd re pêk anî. Serkêşên kurdan ên hêza xwe ji eşîret û qebîleyên xwe digirtin -wekî eşîreta Rawadî- di vê serdemê de serkêşiya Rojhilata Navîn dikir. Di serdema ku osmaniyan yekemîn car gav avêtiye Anatolîayê de pirsgirêka esasî parvekirina îktîdarê bû. Pirsgirêka parvekirina sînoran nebû. Li Rojhilata Navîn li ser navê umetê kî dibû îktîdar, di heman demê de dibû serwerê sînoran jî.

Bi taybetî civaka ereb, ji ber ku di warê hişmendiya olî de serweriya civakî dikir, li pey îktîdarbûnê nedigeriyan. Lewre kî bûbûya îktîdar bi hişmendiya wan a civakî tevdigeriya. Parastina Rojhilata Navîn a li hemberî hêzên xaçperest xala nîrengî ya hemû civakên misilman bû. Osmaniyan piştî şirîkatiya bi kurdan ev taybetiya Rojhilata Navîn nas kir. Û gav bi gav serweriya xwe ya li Rojhilata Navîn tekûz kir. Her çiqas qibleya wan a şer Rojava be jî bingehê serweriyê li ser civakên Rojhilat ava kir. Şibîna kurdan û osmaniyan di vê noqteyê de ji bo osmaniyan bûye pêleka serkeftinê. Pirsa duyemîn jî ew e, teşegirtina kurdan a li gorî hişmendiya ereban e. Tubabûna me kurdan a ji bo qaîdeyên umetiyê di qonaxên dîrokê de li hemberî hişmendiya 'xwebûnê' bûne prangayên esaretê. Pirsa sêyemîn jî, jêdûrketina me ya ji bo taybetiyên xwe yên civakî ye. Ji bo kefşkirina siyasetê em kurd pir derengî mane.

Heta 17'ê gulana 1939'an hayê me ji dek û dolabên şirîkên me nebûye. Di şirîkatiya me kurdan û osmaniyan de du kozikên şerên ku em tê de şer bikin hebûne. Li Rojhilat kozika li hemberî şîayan, li Rojava kozika li hemberî xaçperestan.

Lê di her du kozikan de jî em hatine xapandin. Xapandina yekemîn bi peymana Qesr-i Şirînê re aşkera bû. Piştî peymana Qesr-i Şirînê ya di navbera Osmaniyan û Safewiyan de hatiye îmzekirin Kurdistan bû du parçe.

Dema Muratê IV'emîn li Bexdayê li hemberî Safewiyan şer dikir, di nava artêşên osmaniyan de eşîrên kurd jî hebûn. Osmaniyan li Bexdayê bi piştgiriya eşîrên kurd Safewî têk birin û Peymana Qesr-i Şirînê pê re îmze kir. Safewî ji Bexdayê bûn, lê welatê kurdan jî bû du parçe. Ji bilî parçeyê Kurdistanê yê ku niha destê Îranê ye, hemû Kurdistan bi vê peymanê ket bindestê osmaniyan.

Di serdema ku Peymana Qesr-i Şirîn tê de hatiye îmzekirin, Ehmedê Xanî lêba li kurdan hatiye kirin fêm kiriye. Xaniyê di dewra duyemîn a sedsala 18'emîn de hatiye dinyayê di berhemên xwe yên wêjeyî de bal kişandiye ser hişmendiya netewebûnê û hişyarî kiriye. Lê heta serhildana Edirehman Paşa (1806) hişyariya wî nehatiye fêmkirin. Piştî Evdirehman Paşa, Bedirxaniyan û Şêx Ubeydulahê Nehrî bizavên serxwebûnê birêxistin kirine, lê serkeftî nebûne. Beriya ku em bên ser lêbandina duyemîn a dîrokî, divê em bi bîr bînin ku sedemê têkçûna serhildanên kurdan ên di sedsala 19'an de li ser pêrebûna me ya ji bo rêgezên umetbûnê diqewimin. Ji serdema 10'an heta serdema 20'an hezar salan me paletiya umetê kir û birayên 'misilman' dek û dolabên xwe li hemberî me gerandin. Rûpelê reş ê di serdema 20'an de li dîrokê hatiye zêdekirin ji peymana Lozanê ya ku di 24'ê tîrmeha 1924'ê de hatiye îmzekirin, em dibînin. 284 salan piştî Peymana Qesr-i Şirînê Kurdistan vê carê bi destê Rojava û Tirkiyeyê bû çar parçe.

Îro piştî 360 salan em hewl didin ku dîroka xwe ji nû ve bixwînin û dek û dolabên li hemberî me hatine zivirandin fêm bikin. Umetparezên me yên ku em ji bo xwe kiribûn şerekên kozikên xerbê, bi Lozanê du deziyên ziwa ji guhên me kişandin' û em danîn ber derî. Di qonaxa sedsala 20'an de me hewl da ku van fen û fêlan pûç derbixin. Lê nebû. Sal û zeman guherîn. Sedsala 21'an dest pê kir, hê jî heman livbaziya me didome.

## Serhildanên sedsala 20'an

Ji destpêka sedsala 20'an şûnde bênavber, geh li Başûr, geh li Rojhilat û geh li Bakur agirê azadiyê ji hundirê me venemirî. Lê noqteya dawî jî me nekariye noqeya dawî ji bo têkoşîna azadiyê deynin.

***1905*** - Serhildana Bazîd-Bedlîsê
***1906*** - Serhildana Bişarê Çeto
***1907***-1909 -Serhildanên Dêrsimê
***1908*** -Serhilana Hemawendî
***1909*** -Serhildana Silêmaniyê
***1913*** -Serhildana Mele Selîm û Şêx Şehabedîn
***1914*** -Serhildana Barzan
***1919***-1922 -Serhildana Simkoyê Şikakî
***1919*** -Serhildana Eliyê Batê
***1919*** -Serhildana Yekemîn a Berzencî
***1919*** -Serhildana Mûsa Begê Kurd (Konya)
***1920*** -Serhildana Şivan Xudo
***1920*** -Serhildana Eşîreta Milan
***1920*** -Serhildana Cemîlê Çeto
***1921*** -Serhildana Koçgiriyê
***1923*** -Serhildana Duyemîn a Berzencî
***1924*** -Serhildana Bêşebabê
***1925*** -Serhildana Şêx Seîd
***1925*** -Serhildana Nehriyê
***1925*** -Serhildana Reşkotan û Ramanê
***1926*** -Serhildana Hezroyê
***1926*** -Serhildana Yekemîn a Agirî
***1926*** -Serhildana Koçuşagi
***1927*** -Serhildana Mutkiyê
***1927*** -Serhildana Duyemîn a Agirî
***1927*** -Serhildana Bîcarê
***1928*** -Serhildana Sason - Berwarî û Hezoyê
***1929*** -Serhildana Resûlê Serhildêr
***1929*** -Serhildana Tendurekê
***1930*** -Serhildana Sawirê
***1930*** -Serhildana Zîlanê
***1930*** -Serhildana Oremarê
***1930*** -Serhildana Sêyemîn a Agirî
***1930*** -Serhildana Pilûmûrê
***1930*** -Serhildana Sêyemîn a Berzencî
***1931*** -Serhildana Şêx Ehmed Barzanî
***1937*** -Serhildana Dêrsimê
***1943*** -Serhildana Yekemîn a Mela Mistefa Barzanî
***1945-1946*** -Serhildana Mehabadê
***1961*** -Serhildana Duyemîn a Mela Mistefa Barzanî
***1979*** -Serhildana Komelayê
***1984*** -Serhildana PKK'ê
***1989*** -Serhildana Kurdistana Laçîn (Wekîl Mistefayev)
***1991*** -Serhildana Yekemîn a Başûrê Kurdistanê
***1992*** -Serhildana Duyemîn a Başûrê Kurdistanê



**Awêne**

Samî Tan
sberbeyan@yahoo.com

## Heke zîhniyet biguhere, çareserî hêsan e

Gelo îcar dê deriyê çareseriyê vebe? Ev çend hefte ne her kes kêşeya kurdî nîqaş dike. Mijar ji her aliyî ve tê nîqaşkirin. Her yek navekî li mijarê dike; li gorî bîr û baweriya xwe, li gorî têgihîştin û zanîna xwe analîzekê dike. Mijar bi boneya gelek bûyeran tê nîqaşkirin; hevpeyvîna ku Hasan Cemal bi Serokê Desteya Rêveber a KCK'ê Murat Karayilan re kirî, daxuyaniyên Serokomarê Tirkiyeyê Abdullah Gul, bûyera Zanqirtê, agirbesta yekalî ya PKK'ê, girtina rayedarên DTP'ê, axaftina Serokê Amerîkayê Obama û hwd. Ez jî wekî gelek kesan hêvî dikim ku êdî ev nîqaş ji çareseriyê re xizmetê bikin, êdî deriyê çareseriya demokratîk û aştiyeke mayînde vebe.

Lê dîsa jî mirov dema ku bal û guhên xwe dide nirxandinên nivîskarên çapemeniya Tirkiyeyê mirov digihêje wê baweriyê ku çareseriya vê kêşeyê pir dijwar e. Ji ber ku gelek aliyên mijarê hene, gelek hêz û derdor bandorê li aliyên pirsgirêkê dikin. Qet nebe gelek kes wisa dibêjin û wisa bawer dikin. Ev bawerî ne pûç e, xwediyê vê bîr û baweriyê heta radeyekê mafdar in.

Lê dema ku mirov hinek din bi hûrbînî li mijarê dinêre, mirov dibîne ku li ber çareseriyê astengiyeke sereke heye, ew jî zîhniyeta dogmatîk a neteweperest e. Xwediyê vê zîhniyetê naxwazin guherîn û pêşveçûnên li cîhanê, qonaxên ku mirovahiyê li pey xwe hiştine bibînin. Ew naxwazin xwe li gorî van rastiyan nû û nûjen bikin, hê jî bi bîr û ramana sedsala 19'an difikirin û çareseriyeke li gorî pergala wê demê dixwazin. Ew pergal jî destûrê nade çareseriyeke nûjen û demokratîk. Ji bo xwediyê vê ramanê tekane riya çareseriyê ev e ku kurd dev ji doza maf û azadiyên xwe berdin û xwe radestî pergala heyî bikin. Ji lew re jî heta ku rayedarên Tirkiyeyê dev ji helwesta yek-netewe bernedin pirsgirêk çareser nabe. Li vir du rê hene; ya dê rastiya neteweyî ya heyî were pejirandin û pergaleke du-neteweyî were pejirandin. Lewre li holê du netewe; kurd û tirk hene. Heke em vê riyê bidin ber xwe em ê çareseriyeke demdemî û li gorî têgihîştina sedsala 20'an bi dest bixin.

Riya duyemîn jî avakirina pergaleke welatiniyê li ser bingeha "neteweyeke demokratîk e". Her çiqas di van mercên Rojhilata Navîn de avakirin û domandina pergaleke wiha pir dijwar be jî, çareseriya mayinde ev e. Ev cure welatinî bingeha pergaleke pirçandî, pirzimanî, pirnasnameyî ava dike. Heke pergaleke wiha li Tirkiyeyê were avakirin, bingeha pergaleke di ser netewetiyê re jî pêk tê.

Lê zîhniyeta sedsala 20'an nikare pêşengiya avakirina pergaleke wiha bike, lewre li gorî baweriya wan, netewetî ne qonaxeke demdemî ye, ji mêj ve heye û dê hetahetayê bidome. Xwediyê vê baweriyê ji bîr dikin ku berî çend sedsalan xwediyên pergalên wê demê jî formên civakî yên demê wekî formê hetahetayî difikirîn, lê wisa nebû.

Astengiya li ber çareseriyê ev e. Ev zîhniyet nahêle ku deriyê çareseriyê vebe. Her wekî çawan hoz û eşîran di şerên hozî de qira hev dianî. Niha jî tê xwestin ku netewe qira hev bînin. Heke ev zîhniyet biguhere, çareseriya doza kurdan pir hêsan e, lê heke neguhere, çareserî ne pêkan e, lewre parastina hebûna xwe mafê herî rewa ye, kes mohra xwe li bin fermana qirkirina xwe nade.

HAWAR
Aram Basın Reklam ve Yayıncılık Tic. San. Ltd. Şti.
Adına İmtiyaz Sahibi ve Sorumlu Yazı İşleri Müdürü
Bedri ADANIR
*Adres:* Kooperatif Mahallesi Gevran Caddesi 1 Geçit. Sarıoğlu Apt. Kat: 4 No:14 Ofis Yenişehir - Diyarbakır
*TEL:* 0 (412) 229 00 30
*Fax:* 0 (412) 229 00 39

Baskı *(ÇAP):*
*Stenbol:* Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti. Beşyol Mah. Akasya Sok. No: 23/A Sefaköy - Küçükçekmece İstanbul
*Tel:* 0 (212) 580 63 80
*Edene:* Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtcılık A.Ş İstîklal mah. İstîklal. Cad. *No:* 44 Seyhan Edene
**Yayın Türü:** Süreli



# Aaaax û ax!

**FATMA OZBAY**

Bi şemitîna lingê xwe veciniqî. Bîr nebiribû ku koncalek heye li vê derê. Ax û giyayê ku bi nedaviyê (çiy) şil bûbû, bêtir şemitok bûbû. Destê xwe da ser çonga xwe û hêza xwe kir. Dema şemitandinê çonga wî li kevirên binê koncalê ketibû. Pîneya ser şalwarê wî ya pizirî ku bi xwe jî pizirî bû ji hev çûbû. Çonga wî şeqitîbû.

Bi çavên matmayî li derdora xwe nêrî. Siya xemeke derman nebûyî kete nava perda dilê wî. Êşa çonga wî li aliyekî ma, şewata birînê ji bîr kir. Xwe ji bîr kiribû. Sedema nedîtinê mezinbûna gihayê nîn bû, jibîrkirina koncalê bû. Di xeyalên xwe de, heta di xewnên xwe de bihost bihost li van deran geriyabû. Her kevir, her dîmen neqişîbû hişmendiya wî. Bawer nedikir ku wê rojekê şopa van deran ji bîr bike, lê belê ev ji bîr kiribû.

Bi giranî destê xwe avête parçeyek axa sewadar. Axê danî ser çonga xwe ya birîndar. Ji çûkaniya xwe vir de wisa hîn bûbû. Kengî dereke wî bi birîn bûbûya piçek axa hûr direşande ser, da ku xwîna birînê bisekinîne û bikewîne.

Piştî ku ji koncalê derket, boxçika xwe ya ku li pişta xwe girêdabû palmûkand. Ev jî hînbûyînek bû. Hin di zarokatiya xwe de dema diçû zozanan ber berxikan, boxçika nanê xwe yê ku dayika wî amade dikir li hev dipêça û li pişta xwe girêdida.

Bi pêçiyên hînbûyî girêka boxçikê vekir. Ji nû ve pêça û li pişta xwe girêda. Berê xwe da rojhilat û meşa xwe domand. Girê mezin jî wekî hînbuyînekê li cihê xwe bû. Roj ji lûtkeya ser hêdî hêdî bilind dibû. Tîrêjên wê ber bi qûntarê ve diherikîn. Deşt hin di bin siya sibehê de bû. Serê xwe bilind kir û kesereke kûr kişand. Hilmeke kewgirî kete rûyê wî. Destê xwê yê bi ax li ser ruyê xwe gerand. Tevlî hilma sersiya sibehê behna axê û gihayê kûr kûr kişande nava xwe. Ax, giha, sersî, û gir wekî kovanek laşê wî û giyana wî pêçandin. Bi nêrînên xwe noqî lûtkeya gir bû. Bi biruyên cotbûyî li erdê nêrî. Bi hestekî tayî tevli kovanê bû. Libên axê nava rûyê xwe yê spî de mist da.

Zozan li dûr mabûn, zarokatiya li ser wê axê jî. Lê îro bîranîn jî qedexe bûbûn. Kesereke din ku ji hênikahiya sibehê germtir bû ji hinava dilê xwe kişand. Nexwe dûrketinê jî mezin dikir kovan; êşên kombûyî jî, berhevbûyî jî… Herhal di zaroktiya wê de jî ax ji hînbûyînekê zêdetir ne tiştek bû, li ser vê axê serpêhatiyên bav û kalan weke çîrokan bûn. Lê îro wekî mecnûnekî bi dilekî bengî û qaçax li van deran digeriya.

Çavên xwe yên ku bi van hestan tijî bûbûn bi destê xwe yê biax paqij kir û ber bi qûntara gir ve meşiya. Her kevirek bîranînek vedigot. Her qewdek giha demsaleke nejiyayî dianî bîra wê. Tam heft salan bihara vê axê nedîtibû. Heft demsal bûbûn wek kovanên berhevbûyî. Gelo kî, kîjan giyanewer kîjan dar û daristan xwe radigirt, dijiya wisa dûrî koka xwe, dûrî warê xwe? Bilbil anî bîra xwe, ku warê xwe neguhertibû bi qefesa zêrîn, bi tu tiştan. Loma wekî bengiyan wekî mecnûnan berê xwe dabû van çol û keviran.

Ev cara sisiyan bû ku dihate serdana bîranînan. Wekî eşqiyatiyeke bênav wekî dildarekî ku evîndara xwe windakirî digeriya li van deran. Difikirî, ji xwe dipirsî car caran; gelo li van deran li çi digeriya? Li bersiva xwe jî digeriya. Li çi nedigeriya ku! Wateya xwe li derve hiştibû. Qey jiyanek bê temen û bê wate hebû? Bajar hebûn, warên dûr hebûn, mirov lê dijîn; lê ne yên wî bûn. Li piştî wî gundî goristana gund hebû. Çîrokên ku dayika wî vedigotin, kalikê wî yê ku bi ebaya xwe ya qemer li hespê xwe yê seglawî siwar dibû li wê derê bûn. Li binyata gir di nava zinaran de şikefta Hemo hebû. Serpêhatiya wî ji kalikê xwe guhdarî kiribû. Pîşekarek ermenî bû. Ji aliyê cîranê xwe yê kurd ku ji hev re digotin kirîv hatibû kuştin. Êşa Hemo jî li wê derê bû. Ne dihate hilgirtin û ne jî diçû cihekî din. Li wê derê çi dikir? Li wê derê çi digeriya? Carinan li hemberî gund bi saetan rûdinişt, û bi çavên xombûyî li dîmena xopana gund dimêzand. Carinan li derdora gund çerx dibû, rûdinişt, xwe dirêj kir, li ezman dinêrî.

Bê vê axê, bê vî gihayî, bê vê girê bilind gelo kî dikaribû wî fêm bikira. Dema ku bavê wî bihîst diçe gund, tirsiya, aciz bû. Nexwest ku ew biçe gund, qada qedexe. Xwest ku ew jî wekî kulîlkên camekanan ji koka xwe dûr bikeve û hînî vê rewşê bibe. Nexwe ne zilm û zorî, tirsê vê qadê kiribû xopan. Jixwe ji biyanîbûnê jî fêm nedikir. Hemû dûr ketibûn, jê re bûbûn biyan. Dema dît ku ji fikar û gazincan xelas nabe, soz da, got ew qada qedexe gerdenaza bibe jî dê neçe wan deran. Lê ji çend hefta zêdetir xwe ranegirt. Dema demsal ber bi biharê ve herikî careke din kete riya gund.

Êdî ji qûntara gir xopana gund xuya dikir. Ew gund di hestên wî de her tim dişewitî. Alavek venemirî û qîrîna jin û zarokan her tim li ber çavên wî bûn.

Roj ber bi nîvro de diçû. Sersiya sibehê zûda ve belav bibû. Nexwest wê demê bikeve nava gund. Nexwest wekî rêwiyekî demborî, ne jî wekî mazûbanekî asayî ji nav derbas bibe. Pejna asayîbûnê wekî gunehekî bû. Giha heta çongan bejn avêtibû. Erg û mişarên xerabûyî ji giha û dirişkan nedihatin xuyan. Zê riya herikîna xwe winda kiribû. Bi xemgînî li dirişk û serberdayibûna gihê nêrî. Jê re wisa hat ku her tişt, zê, diriskan, giha, axê li hember xwezayê serî rakirine. Her tişt rewşa xopan wekî wî dijî û wekî wî dihesîne. Li derdora xwe nêrî, li cihekî bêsitîrî û guncav rûnişt... Boxçika xwe vekir û li pêşiya xwe raxist. Nîv nanê tenûrê û parçeyek penêrê sîrik danî ber xwe. Rabû bi gavên giran çû ber Zê. Li ser kevirekî rûnişt. Xwe giran û westandî hest kir. Kêliyekî bêliv sekinî, çave xwe girt û xweza guhdarî kir. Dengê herikîna avê, hejîna gihayê, di bêdengiya nîvro de tevli dengê pirîna kêzik û pinpinîkan dibû. Li xwe û xwezayê guhdarî kir,

Hêdî hêdî û bi giranî dest û rûyê xwe şuşt. Bi herdû kulmên xwe ji ava Zê, ku kevirên binî ji zelaliya wê xuya dikirin, vexwar. Piştre hêdî hêdî vegeriya ber bergeşa xwe, rûnişt. Nan û penêrê xwe yê sîrik xwar. Ji ber ku piraniya diranên wî tunebûn hêdî hêdî dixwar. Roj li nivro qulibîbû. Bergeşa xwe pêça, li aliyekî danî. Pêlavên xwe wekî balgiyekî danî kêleka xwe. Xwe dirêj kir, sere xwe danî ser pêlavên xwe. Lûtkeya gir hêdî hedî dikete nav sersiyê. Bayekî hênik û tenik gihê li bin guhê hev dixist, bi aheng dihejiyan.

Dengê ava Zê wekî riyekî bê dawî tevli keliyê dibû. Serê xwe rakir, li ezmana kûr û dûr nêrî. Komên êwrên biharê wekî komên berfê li ezman diliviyan. Wekî ku li ser cemedê bin diherikîn. Bê hay kenekî melûli ser lêv û rûyê wî danî. Zarokatiya wî kete bîra wî. Berxik li mêrga Colemêrgê belav dibûn. Zarok di nav çayir de direviyan, dikeniyan di nav gihê de hevdû digindirandin. Piştre beyî ku bifikirin berxikên wan ku de diçin, xwe li ser giha li ser piştê dirêj dikirin. Çavên wan li ewrên berfînî bûn. Dikeniyan û nişane hev didan.

- Ew ewrê han yê min e. Wekî hiriya berxikan e

- Na! yê min xweşiktir e.Wekî loda berfê ye. Xwezika ez li ser wî rûniştama. Ez li ser bim ez ê ser rûnêm û lingê xwe helkim.

- Ez li ser bim, ez ê ji jor de li we binêrim. Destê xwe ji we re bihejînim. Mirov li ser ewr be, mirovên erdê hûrik xuya dikin.

Li jêr nihêrtin. Dêşt bêdawî dirêj dibû. Bi çavên xwe beyî ku li astengiyekê bikevin, di nav deştê de diherikîn.

Axa biharê bi liva zayînê navmila wî germ kiribû. Wekî ku ji zarokekî hez bike destê xwe li ser axê bir û anî. Bi kulma xwe axê rakir anî ber rûyê xwe, têr behn kir. Weka tejiyekê ji nava pişta wî kişiya û kesera xwe bi nav kir:

"Aaaax û ax!"

Roj bi bêdengî diherikîn. Ba û barana biharê bêxem, bi sersarî li nav gihayan diqulibîn. Lê wekî payîzeke pejirî tu şop neçûn wan deran. Piştî heft rojan şivanekî ku destûrnamê girtibû, tevli keriyê xwe kete qada qedexe. Piştî ku pezê xwe çêrand, xwest pez bibe ser avê, av bide pez. Dema ber bi çayirê ve hat, çave wî ji dûr de li reşahiyek ket. Got qey sewalek li wê derê diçêre. Lê dît ku ew reşahî nalive. Ji xwe re got: "nexwe kevir e, lê naşibe keviran jî." Dema têr nêzik bû, dît ku mirovek xwe di nav cayir de dirêj kiriye. Xwe hinek din nêz kir. Hinek tirsiya. Cara yekem bû ku dihat qada qedexe, nedixwest sere wî bikeve belayê. Destê xwe avêt destûrnameya bêrîka xwe û hêdî hêdî ber bi kesê dirêjbûyî ve meşiya.

Pezê ku çave wî li avê ketibû, bi hengame berjêrî ser avê bûbû. Dengê zengil û merina pez nava hev diket. Lê mirovê dirêjbûyî qet nediliviya. Dema ku şivan nêzik bû, dît ku mirovekî kal e, li ser axê razaye. Pêlava xwe daniye ber sere xwe. Şivan bi hesteke fedîkar sere xwe ji tirs û qisaweta xwe re hêjand, du sê gavên din avêt û bi dengekî nerm gazî kir:

- Xalo, selamun aleykum.

Deng ji mirovê dirêjbûyî derneket û neliviya.

Şivan dubare kir:

- Dem xweş be Hecî! Mêze dikim tu li ber hênikahiya biharê gelekî kûr raketi yî.

Dîsa deng nekir, bersiv neda û ne liviya. Şivan hinek din nêz bû û xwe ser de xwar kir. Ser rûyê kalê dirêjbûyî wekî xwedan dabe zîpik zîpikî bûbû. Libên axê di nava rihê wî yê spî de belav û şil bûbû.


Şivan veciniqî û bi awirekî matmayî got: "Waaa! Ev Hesenê kal ê. Çi digere li van deran? Qey hatiya gundê xwe yê wêran!.."

Destê xwe avête milê kalo û hêdîka hejand. Lê di heman kêliyê de bi veciniqîn destê xwe şûn de kişand. Lewre Hesenê Kal ji zû de ji van deran çûbû…

## Perperîk

*Perperîk*
*Azad û azawa xweza ye*
*Firek ji temen e.*
*Temên bi kovan*
*Fir bide azadiya min*
*Fir bide perperîk*
*Fir bide...*
*Xalxalok*
*Oxira zarokatiya min*
*bû*
*Xweziyê min*
*Dibirin ji xalo re*
*Bêrîkirin û hezkirin jî pê re*
*Mamê pîs*
*Wek dayîka min*
*Konên xeman dihûne*
*Bi ser birînên bê derman*
*de...*
*Dotmama min*
*Rista evînê*

*Bi teşiya ji dara gûzê*
*Dirêse*
*Dapîra min*



*Kul û janan*
*Di meşkê de*
*Bi darê lewlebê*
*Dikeyîne....*
*Bi nahûrandinê re*
*Rondik xwîn diherikin..*
*Ez bêmecal im*
*Di birka xeman de*
*Bi şorevkê*
*Birînên dikewînim...*
*Lê;*
*Poşiya te ya heftreng*
*Bi ser rûdêm de*
*berdayî?*
*Biskên guliya te*
*Mijang mizdayî dibînim*
*Di payîza dilê min de*
*Belgên biharê vedibin*

**OSMAN KAPAN**



**Îrfan Çintay**
**(17.05.1994 / Bêzar)**

# BÎRANÎN

*28 dil*
*...*
*Ber bi çiyayên 'mor' ve*
*meşiyan*
*Têhna we wekî bayê 28 dilan*
*Gurzên ronahiyê ber bi*
*asoyan ve birin*
*Bi bêhna axê hatibûn*
*barkirin*
*Porê xwe dan ber bayê*
*Û stranên xwe yên dilşewat*
*Hinan li pey xwe nihêrî*
*Hinan jî fedî kir li paş xwe*
*binêrin*
*Û ketin nava tarî û tarîsanê*
*28 giyan, 28 dil...*

*Di 15'emîn salvegera şehadeta şehîdên çiyayê Bêzarê*
*de em bejna xwe li ber bîranîna wan ditewînin…*
*Xeyalên wan soza me ye*

**MALBATA ÇINTAY**

www.arsivakurdi.org



# Cejna Zimanê Kurdî didome

**Cejna Zimanê Kurdî li Ewropa, metropolên Tirkiyeyê û Kurdistanê bi çalakiyan tê pîrozkirin. Di çalakiyên ku hefteyekê bidomin de kurd zextên li ser ziman şermezar dikin û banga xwedîderketina li ziman dikin**

**NAVENDA NÛÇEYAN** - AMED



Cejna Zimanê kurdî li Edene, Enqere, Mêrsîn û Îzmîrê bi şahiyan hate pîrozkirin. Di şahiyan de hate xwestin ku zimanê kurdî bibe zimanê fermî û bê parastin.

Komîsyona TZPKurdî ya Îzmîrê, li NÇM'ê di çarçoveya 15'ê Gulanê Cejna Zimanê Kurdî de şahiyek pêk anî. Di şahiyê de ligel endam û rêveberên DTP, NÇM, DOKH, YDG-M, ÎHD, Însiyatifa Dayikên Aştiyê ya Îzmîrê jî di nav de gelek kes amade bûn. Şahiyê bi rêzgirtinê dest pê kir û bi nîqaşên li ser kurdî û slaytên li ser xebatên kurdî dom kir. Di şahiyê de Endamê Komîsyona TZPKurdî Mustafa Borak, diyar kir ku zimanê kurdî rastî gelek astengiyên nezin hatiye û ligel hemû zor û zehmetiyan xwe gihandiye roja îro. Borak, xwest zimanê kurdî bibe zimanê fermî û têkeve bin ewlehiya makezagonê. Endama Komîsyona TZPKurdî Hatîce Şen jî der barê xebatên TZPKurdî de agahî dan û cejna ziman pîroz kir. Piştî axaftinan slaytên ku ji wêneyên Ehmedê Xanî, Mîr Celal Bedîrxan, Cigerxwîn, Osman Sebrî û şexsiyetên mezin nîşan dan. Piştî temaşekirina slaytan Koma NÇM'ê konsereke biçûk da.

### Li Edeneyê sertîfîka hatin dayîn

Li Edeneyê jî bi munasebeta Cejna Zimanê Kurdî xebatkarên TZPKurdî li Bebe Muzikhol a Navçeya Seyhanê pîrozbahî pêk anîn. Di pîrozbahiyê de pankarta li ser 'Bila zimanê kurdî bibe zimanê fermî' hate vekirin. Di şahiyê de gelek rêveberên DTP'ê û nûnerên saziyên civakî amade bûn. Şahiyê bi rêzgirtinê dest pê kir. Piştî rêzgirtinê Xebatkarê TZP-Kurdî û Mamosteyê Ziman Arjen Raif Qoserî, axaftinek kir. Qoserî, anî ziman ku du sal e cejna ziman tê pîrozkirin û her ku diçe ev cejn li welatên derve jî belav dibe. Piştî axaftinan dengbêjan klam gotin. Klamên dengbêjan bi dirûşma "Bê ziman jiyan nabe", "Bê serok jiyan nabe" hate qutkirin. Piştî klaman mamosteyên kurdî, sertîfîka da qursiyerên beşdarî kursa mamostetiyê ya simanê kurdî bibûn. Şahî bi stanên Koma Şitlên Azadî bi dawî bû.

### Li Enqereyê jî cejn hat pîrozkirin

Li Komeleya Kurdî Der'a Enqereyê bi amadekariya Kurdî Der û beşdariya parlamenterên DTP'ê Hamît Geylanî, Osman Ozçelîk, nivîskar Canîp Yildirim, Îsmaîl Beşîkçî, Wezîrê Dadê yê berê Adnan Ekmen û endamên TZPKurdî, şahiyek hate lidarxistin. Di despêka şahiyê de ji bo kesên di têkoşîna aştî û demokrasiyê de jiyana xwe ji dest dane rêz hate girtin. Piştî rêzgirtinê Serokê Kurdî Derê Ahmet Aday, diyar kir ku wan Cejna Zimanê Kurdî li gorî salvegera weşana Hawar ku ji aliyê Celadet Alî Bedirxan ve hatiye çapkirin îlan kiriye. Piştî axaftinan Dengbêj Apê Yasîn bi kurdî klam gotin û şahî bi nîqaşên li ser zimanê kurdî bi dawî bû.

### Li Mêrsînê hezar kes beşdar bûn

Şahiya Cejna Zimanê Kurdî li Salona Dawetê ya Hasret a Navçeya Akdenîzê pêk hat. Şahiya ku ji aliyê Meclîsa Ciwanên Welatparêz û Demokrat ên Mêrsînê 'YDG-M) ve hate lidarxistin ligel Şaredarê Akdenîzê M.Fazil Turk, Endamê Meclîsa DTP'ê Ferhan Tarhan, endam û rêveberên OZYURT-DER, MKM-DER nêzî hezar kesî amade bûn. Şahiyê bi rêzgirtinê dest pê kir. Di şahiyê de pankartên, "Cerdevanî rûreşî ye", "Zimanê me rûmeta me ye" hatin vekirin. Di şahiyê de bênavber dirûşmên; "Bijî Serok Apo" û "Şehîd namirin" hatin qêrîn. Di şahiyê de Şaredar M.Fazil Turk û Endamê Meclîsa DTP'ê Ferhan Turk axaftin kirin û xwest ciwan xwe bi rêxistin bikin û li zimanê xwe xwedî derkevin. YDG-M'ê li ser girîngiya rojê peyamek xwend û hat gotin ciwan li hemberî înkar, îmha û asîmîlasyonê parêzvanên ziman û çandê ne. Piştî axaftinê Koma Muzîkê ya MKM-DER'ê, Turan Şengul û Fereç konser dan.

## Endamên mamosteyan di Cejna Zimanê Kurdî de sertîfîkayên xwe wergirtin

Kesên ku di Kursa Zimanê Kurdî de ku bi piştgiriya Kongreya Neteweya Kurdistanê û Komîsyona Perwerde û Ziman hatibû vekirin perwerde dibûn, sertîfîkaya mamostetiya kurdî wergirtin.

Di salên dawî de aktîvîteyên zimanê kurdî li Ewropayê her diçe zêde dibin. Ji bo pêşvebirin, nasîn û zimanê kurdî bibe zimanê perwerdehiyê KNK'ê cara yekem di sala 2006'an de 'Cejna Zimanê Kurdî' îlan kir. Cejna Zimanê Kurdî bi biryara KNK'ê 3 rojan tê pîrozkirin. Kursa Zimanê Kurdî ku li paytexta Danîmarkayê li Kopenhagê hatibû vekirin xebatên xwe di cejna ziman de bi dawî kir.

Kursa ku di meha çileyê de dest pê kir 15 hefteyan dom kir. Kurs li Danîmarkayê ji aliyê gelek saziyê kurd ve hate vekirin û gelek saziyan alîkarî dan vekirina kursê. 11 mamosteyên kurd, pedagog û xwendekarên beşa fîlolojiyê beşdarî kursê bûn. 6 jê jin 5 mêr bi giştî 11 endamên mamostetiya zimanê kurdî bi serketî kurs qedandin. Sertîfîkayên mamosteyan ji aliyê serokê Komîsyon û Perwerdehiyê ya KNK'ê Rojan Hazim ve hat dayîn. Xizmên kursiyeran, rêvebirê Fey-Kurdê Îbrahîm Surucî, Şoreş Bilikan û serokê Fokus-A'yê Necatî Harmankaya û endamên komeleyê beşdar bûn.

Mamosteyên ku sertîfîkaya mamostetiyê wergirtin dê li Danîmarkayê di dibistanên gel û saziyên kurdan de kursan bidin zarokên kurd. Serokê Komîsyon û Perwerdehiyê yê KNK'ê Rojan Hazim anî ziman ku kursên zimanê kurdî dê li Ewropayê bi awayekî rêkûpêk bên zêdekirin. **KOPENHAG**

## W bi mijarên girîng derket

Kovara W ku ji du mehan carekê derdikeve di hejmara xwe ya gulan-hezîranê de dosyaya 'Kurdolojî; çi, çima, çawa?' digihîne ber destê xwendevanên kurdî. Her wiha hevpeyvîna bi Rênas Jiyan re jî hatiye kirin balê dikişîne.

Kovara wêjeyî, çandî û hunerî W bi hejmara xwe ya 26'an derket. Kovara W di vê hejmara xwe de dosyaya 'kurdolojî; çi, çima, çawa?' ji xwendevanên xwe re vediçirîne. Rohat Alakom bi "Kurtebehseke pêşketina kurdnasiyê (1988-2008), Samî Tan bi "Daxwaza kurdan perwerdehî ye ne kurdolojî ye", Salîh Akin bi "lêkolînên kurdolojiyê li Fransayê", Mihemed Ronahî "kurdolojî: Zanista hesta netewî" û hevpeyvîna bi Efrasyab Hewramî re mijara kurdolojiyê ji xwendevanên xwe re rave dike.

Ji bilî dosyayê nivîsên weke çîrok, helbest û pexşan di kovarê de cihên xwe digirin wiha ne: Rêka dibistanê - Brahîm Ronîzer, Tu ku de diçî - Mehmet Devîren, Rojên derew - Yûsiv Biyanî, Girê zilamtiyê - Lokman Ayebe, Guldesteyek helbest - Reyhan Sarhan, Carinan mirov xwe jî dikuje - Şener Ozmen, Strî û gul - Dilşêr Bêwar, Veqetîn - Baxdat Arda, Ji min re bibêjin Îsmaîl - Yavuz Ekîncî, Êdî bêhna te tê- Nesrîn Navdar, Goristana hêsrên rizyayî - Îrfan Amîda, Xwircezîna dil - Fatma Savci, Tazî - Şevger Çiya, Di romana kurdî de pêngaveke pirhêl: Rojnivîska Spînoza - Yapob Tilermenî, Portre - Fewzî Bîlge, Ji William Shakespeare çend sone - Kawa Nemir, Di neynika pirtûkê de - Yunus Eroglu.

Di kovarê de bi Rênas Jiyan ê ku bi rêça Kovara Rewşen û dînamîzma 1990'î de qûçên helbest û fikir û pêlan ava kiriye re hevpeyvînek li ser Janya, Mexzena Xwînê, Di Tuwaletê De û Ji Şevê re Çend Têgehên Dera Hanê re hatiye amadekirin. **AMED**



Bahman Ghobadî

## Hesp, kûsî û niha jî pisîk...

**ALÎ GULER** - CANNES

Derhênerê kurd Bahman Ghobadî îcar jî pisîkên Îranê kirin mijara fîlmê xwe. Fîlm di çarçoveya 62'emîn Mîhrîcana Fîlman a Navneteweyî ya Cannesê hat nîşandan û rastî eleqeyê hat. Di fîlm de drama ciwanên ku li Tehranê dijîn û muzîka rockê dikin bi awayekî mîzahî hatiye vegotin.

Derhêner 9 sal beriya niha di heman mîhrîcanê de bi fîlmê 'Dema Hespên Serxweş' xelata kameraya zêrîn û xelata rexneya navneteweyî wergirtibû û niha jî bi fîlmê "Kasi Az Gorbehaye Irani Khabar Nadareh" (Kesek Behsa Pisîkên Îranê Nake) careke din derket pêşberî sînemahezan. Eleqeya Ghobadî ya ji bo sewalan didome. Beriya niha hesp û kûsî niha jî pisîk... derhêner pirsgirêkên gelê xwe û ya gelên Rojhilata Navîn bi riya sewalan vedibêje û ev rêbaz ji xwe re kiriye nasnameyek. Di fîlm de sahneyên ku mirov gelek bi hestiyar bike wekî fîlmên din nîn bin jî sahneya fîlmê ya dawî pir balkêş e.

### Rejîma Tehranê rexne dike

Derhêner ev demeke dirêj e bêdengiya xwe bi fîlmê 'Kesek Behsa Pisîkên Îranê nake' bi dawî kir. Di fîlm de jiyana ciwanên ku Tehranê di bin zextên rejîma Îranê de dijîn, muzîka rock û rapê dikin tê vegotin. Fîlm li kûçeyên Tehranê yên pişt, cihên veşartî ve rejîma Îranê rexne dike û bêtehamuliya rejîma Îranê ya li hember cudahiyan tîne ziman. Lê derhêner piçekî nerm tevgeriyaye. Wekî boksorekî ku 'zêde zexm lê bidim dê bi hêrs êrîşî min bike' hatiye kişandin. Dema mehek berê bi Ghobadî re axivîm gotibû "Me fîlm veşartî kişand. Heke fîlm bê nîşandan dê bi min re mijûl bibin."

### Evîna rockê bû sedema mirina wî

Di fîlm de çîrokeke xweser hatiye bikaranîn û her sahneyek temaşevanan bêtir di meraqê de dihêle. Ghobadî bi kameraya xwe ya destan li kûçeyên Tehranê ketiye pey rockvanan. Xizaniya Îranê jî hatiye nîşandan. Ciwanên bi navê Negar Shaghaghî û Ashkan Koshanejad ji ber ku nikarin tiştên ku dixwazin li Îranê bikin dixwazin Londonê konserekê bidin û ji bo konserê dikevin nav hewldanan. Ciwan nikarin bi riyên qanûnî derkevin derveyî welat lê vê carê jî hewl didin ku bi riyên derqanûnî derkevin. Lê di operasyona li hemberî mafyaya pasaportan de pasaporta wan dikeve destê polîsan û hêviyên xwe winda dikin… Fîlm bi dema Ashkan Koshanejad ji polîsan direve di şibakê de dikeve û jiyana xwe ji dest dide bi dengê Negarê mîstîk ê straneke rockê ve bi dawî dibe.

## Mahsûnî Şerîf tê bibîranîn

Hunermend Mahsûnî Şerîf di 7'emîn salvegera mirina xwe de li Tirkiye û Ewropayê bi hin çalakiyan tê bibîranîn.

Mahsûnî Şerîf di 17'ê gulana 2002'an de li bajarê Koln a Almanyayê jiyana xwe ji dest dabû û li ser wesiyet û daxwaza wî di 19'ê gulanê de li navçeya Hacibektaşa Nevşehîrê hatibû veşartin. Ji bo bîranîna Mahsûnî Şerîf li Hacibektaşê hin çalakî hatin lidarxistin. Li navçeyê konsera ku bi stranên hunermend pêktên hate dayîn. Zarokên Mahsûnî Şerîf Alî û Emrah Mahsûnî û neviyê wî Yigît Ozdemîr jî stranên wî striyan.

Her wiha di 22'ê gulanê de ji bo bîranîna Mahsûnî Şerîf li Sîlîvriya Stenbolê şeva bîranînê tê lidarxistin. Di şeva ku ji aliyê Komeleyên Çandê ya Elewiyan li Mega Saray Salonu bê lidarxistin de stranên hunermend Mahsûnî Şerîf dê bêne gotin. **STENBOL**

## Sersaxî

Bavê hevalê me Mehmet Kiliç
**HUSEYÎN KILIÇ**
Çûye ser dilovaniya xwe.
Em ji malbata wî re sersaxiyê dixwazin.
Xwedê ef û maxfîretê bide û cihê wî buhişta baqî be.

**Xebatkarên Çapemeniya Azad**

# Dê li 6 bajaran konên nobetê vedin

**Bi pêşengiya parlamenterên jin ên DTP'ê di çarçoveya kampanyaya "Em ne namûsa tu kesî ne, namûsa me azadiya me ye" de dê li 6 bajarî konên nobetê bên vedan. Îro li Dêrika Mêrdînê kon tê vedan**

Tevgera Jinan a Azad û Demokratîk (DOKH) di çarçoveya kampanyaya 'Em ne namûsa tu kesî ne, namûsa me azadiya me ye' de li dijî şîdeta li hemberî jinê, kuştina bi hinceta namûsê bi pêşengiya parlamenterên jin ên DTP'ê dê her meh li bajarekî cuda konên nobedariyê vedin.

DOKH'ê di 24'ê mijdarê de Roja Têkoşîna Li Dijî Şîdeta li Hemberî Jinê ya Navneteweyî de kampanyayek bi navê 'Em ne namûsa tu kesî ne, namûsa me azadiya me ye' da destpêkirin. DOKH bi pêşengiya parlamenterên jin ên DTP'ê dê konên nobedariyê li navçeya Dêrika Mêrdînê, Stenbol, Îzmîr, Wan, Riha û Mêrsînê vede.

### Dê têkoşîn bidome

Jin dê starta çalakiya xwe îro li navçeya Dêrika Mêrdînê bidin. Parlamentera DTP'ê ya Şirnexê Sevahîr Bayindir, der barê çalakiyê de axivî û diyar kir ku ev çalakî di çarçoveya kampanyaya 'Em ne namûsa tu kesî ne, namûsa me azadiya me ye' tê organîzekirin. Bayindir, got ku armanc dikin ku li dijî kuştina bi hinceta namûsê, li dijî nêrîna ê din û li dijî zîhniyeta serdest konên nobedariyê bên vedan û di vê mijarê de gel bê agahdarkirin. Bayindir destnîşan kir ku heta ku jin azad nebe, civak jî azad nabe û wiha axaftina xwe dom kir: "Jinan tu carî asta jiyana civakê, siyasî û aborî qebûl nekir û li dijî wê bi salan têkoşîneke bênavber da û dê têkoşîna xwe jî bênavber bidomîne. Em bi vê çalakiyê armanc dikin ku kampanyayê xurtir di nava civakê de pêş bixin."

### Neynika siyaseta fermî a tirkan

Parlamentera Şirnexê Sevahîr Bayindir, bal kişand ser çalakiya konên nobedariyê û got ku di serî de li Dêrika Mêrdînê kon tê vedan. Bayindir, di axaftina xwe de li ser taybetiya hilbijartina Dêrikê sekinî û wiha axaftina xwe dom kir: "Dêrik wekî navçeyeke herî zêde feodal tê dîtin û em dixwazin nêrîna li hemberî navçeyê bi çalakiya xwe biguherînin. Her wiha dewlet bi destê xwe kevneşopiyên paşvemayî pêş dixe. Vê paşvemayînê jî wekî ya kurdan dinirxîne, lê di rastiyê de ev tişt neynika siyaseta fermî ya Tirkiyeyê ye. Lê bi têkoşîna azadiya kurd û têkoşîna azadiya jinan neynika heyî berovajî bû."

Sevahîr Bayindir, daxuyand ku hem çalakiyên bi vî rengî li dar dixin û hem jî qanûnên ku li hemberî jinê hatine derxistin hewl didin ku sererast bikin. Bayindir, da zanîn ku tu carî li benda organîzasyonên dewletê nemane û dê bi şaredariyên heyî statuya jinê pêş bixin, di îstîhdamkirina jinan de pozîtîf nêzik bibin û malên jiyanê yên jinê ava bikin.

### Paşde gavan naavêjin

Bayindir, di axaftina xwe de bal kişand ser asta azadiya jinên kurd û diyar kir ku pêşketina jinan rastî zext û şîdetê tê. Bayindir wiha dirêjî da axaftina xwe: "Tevgera jinan jî nesîbê xwe ji operasyona ku li hemberî DTP'ê pêk hatî girt. Dewlet tu carî di tu mijaran de ji bo jinan kota esas negirtiye lê di dema girtinan de kota pratîze kiriye. Dewlet li aliyekî kurdan bi paşvemayina wan didarizîne li aliyekî jî mudaxaleyî vîna jinên ku ji bo azadiyê têdikoşin dike. Lê jin tu carî dest ji têkoşîna azadiyê bernade û paşde gavan naavêje."




Bayindir, di dawiya axaftina xwe de got ku divê rêxistin, sazî û dezgehên jinan piştgiriyê bidin çalakiya wan. Bayindir, diyar kir ku dê bi hezaran jin li Dêrikê bi hev re ji şîdeta li ser jinê, qetlîam û girtinan re bibêjin na. **AMED / DÎHA**

# Li hemberî pêşbirkê nerazîbûn

Nerazîbûna rêxistinên jinan a li hemberî pêşbirka 'Zaroka herî xweşik hildibijêrin' didome.

Li Îzmîrê rojnameyeke herêmê wêneya zaroka ku cilê bûkanî li xwe kirî weşand û bi vî wêneyî îlana pêşbirkê dike. Pêşbirk îro tê lidarxistin. Sendîka, rêxistin û dezgehên jinan li hemberî vê pêşbirkê nerazîbûnên xwe bi tundî nîşan didin. Her wiha jinan diyar kir ku dê 18'ê gulanê ji Dozgeriya Komara Îzmîrî re gilî bikin.

Nûner û endamên gelek sazî û dezgehên sivîl diyar kir ku pêşbirkên bi vî rengî li ser derûnî û bedena zarokan tehrîbatên geleke mezin pêk tîne û divê pêşbirkên bi vî rengî bêne qedexekirin. Mala Çandê ya Jinan a Çigli Evkaya duyem (ÇEKEV), Komeleya Piştevaniya Jinan a Îzmîrê (İKDD), Komeleya Hiqûqnasên Nûjen (ÇHD), Grûba Xebatê ya Li Dijî Cudaxwaziya Cinsiyetê, Komeleya Jinan a Kedkar (EKD), Însiyatîfa Jinan a Serbixwe (BKÎ), Mala Jinan a Evka ya Yekem (BEKEV), Şaxên Egîtîm Senê ya Îzmîrê û Koordînasyona Jinan a bajar a TMMOB'ê ya Îzmîrê dê 18'ê mehê li ber Edliya Bayrakliya Îzmîrê bicivin û pêşbirkê protesto bikin û gilî bikin. Jin dê bi ber adliyeyê daxuyaniyekê bidin çapemeniyê. Jin dê di daxuyaniyê de balê bikişînin ser pêşbirkên ku zarokan îstîsmar dikin, derûnî û bedena zarokan dixin xetereyê teşhîr bikin. **ÎZMÎR**




**Sersaxî**



Welatparêz û şoreşgerê hêja,
Evîndar û têkoşerê têkoşîna gelê xwe,
Bi bedelên giran te têkoşîn da.
Bi dehan salan li zindanê girtî li hemberî îşkenceyên giran...
Berxwedan û cardin têkoşîn...

*Kadrî Gokdere*
*1957 - 2009*

Meş nîvco namîne heya azadî aştî û serkeftinê dê berdewam be Jiyana te ya bi rûmet dê riya me ronî bike...

**Konfederalîzma Kedê ya Demokratîk**

# Ji girtiyên DOKH'ê re kartên piştgiriyê şandin

Platforma Jinan a Piştevaniya DTP'ê, ji bo pişgiriyê bidin girtiyên Tevgera Jinan a Azad û Demokratîk kart şandin. Endamên platformê li dijî operasyonên li hemberî DTP'ê pêk hatî şermezar kirin û ji bo piştgiriyê bidin girtiyên jin li ber lîseya Galatasarayê civiyan. Gelek nûnerên saziyên jinan tevli çalakiyê bûn. Endamên platformê ji ber lîseya Galatasarayê heta postexaneya Beyogluyê meşiyan. Jinan pankarta 'Ji zext û girtina li hemberî DTP'ê re na' vekir.

Jin heta postexaneyê bi çepik û tilîliyan meşiyan. Li ser navê platformê rêvebera Koperatîfa ÎMECE'yê Canan Ari daxuyanî da. Ari, diyar kir ku piştî hilbijartinên 29'ê adarê li hemberî DTP'ê operasyonê dest pê kir. Ari, destnîşan kir ku operasyon li hemberî aştiyê û têkoşîna azadiya jinan pêk hat û wiha got: "Di hilbijartinan de jinên kurd serkeftinên mezin bi dest xistin. Di nava 17 şaredarên jin de 14 şaredarî yên DTP'ê bûn. Dewletê tehamulî serkeftina hatiye bidestxistin nekir û xwest asteng bike. Lê jin dê li malê û li girtîgehê daxwazên xwe yên azadiyê bînin ziman û têkoşîna xwe bênavber bidomînin."

Ari, destnîşan kir ku kesên ku alîgirê aştî û demokrasiyê ne divê piştgiriyê bidin DTP û DOKH'ê. Ari, got ku divê girtî demildest serbest bêne berdan. Piştî daxuyaniyê jinan ji girtiyên jin re kart şandin. **STENBOL**




## Mizgîn Ronak

# Serfiraziya ziman

Mirov dikare bêje ku dijminê mirov jî wek dostê mirov, awêneya mirov e, ango rewşa wî rastiya mirov dide ravekirin. Mînak nêzîkatiyên dewletê yên piştî serfiraziya hilbijartinê, asta nasname û hêza me baş dide xuyandin. Ji bo ku kurd herî pir di van deman de bû 'kurd', bû vîndar û hêzdar; dewletê rûyê xwe yê rastî da xuyakirin. Hat fêmkirin ku ew stratejiyên çareseriyê (!) yên berî hilbijartinê tevî derew û xapandin bûn.

Xuya ye ku rojnameya Tarafê jî di vî aliyî de 'Taraf' e, alî ye, lewre herî pir vê rojnameyê behsa paket û çareseriyan, heta behsa têbirîna (ku ev yek gelek girîng e) dirûşme û gotinên faşîst yên li Kurdistanê jî dikir. Lê paşê deng hate birîn, negotin ku ew nûçe çima rast jî derneketin. Jixwe di demên wiha de timî wisa dibe, kes xwedî dernakeve…

Lê ya girîng ev e ku em vê sekna xwe ya vîndar sist nekin û serfiraziyên civakî yên derûnî, yên jiyanî û siyasî zêdetir bikin. Jixwe serfirazî û binkeftin di demên wiha de wek siyê û roniyê bi hev ve girêdayî ne. Loma jî nêzîkatiyek çewt, gavavêtinek ne di cih de, dibe sedema windakirinên mezin.

Gava ku em li rewşa xwe ya heyî mêze dikin, dibînin ku sekneke serfiraz heye, rihê yekîtiyê gihîştiye asteke bilind. Ya ku dewletê 'ji eyar derdixe' jî (bi qewlê pêşiyên me ve) ev e. Lê çavên xwe li çar alî vekirine û li benda westanek, li benda sistahî û nakokiyên me ne.

Loma jî divê em fersenda serkeftinan tu car nedinê û vê meş û têkoşîna xwe geştir bikin. Divê em rûyên zordestiyê yên hezar tewreyî li her derî bibînin û mehkûm bikin. Lewre carna muzîka arabesk e, carna rêzefîlmên Tv'ê ne, carna siyesatmedarên kurd in, carna jî tirkîtî û tirkî ye.

Ji bo ku me got tirkî em dikarin behsa rewşa kurdî jî bikin. Her çiqas ku rewşa me ya di vê mijara girîng de ji berê baştir be jî ne bes e.

Ango tevî ku kurd gihîştiye sekneke yekgirtî û vîndar jî, hê xwe negihandiye kurdiyeke zelal û bes, kurdiyek ku di 24 saetên jiyanê de heye.

Loma jî divê em hedefa 'dibistankirina mal û taxan' pêk bînin û demsalên xwe bi serkeftinên zimanî bixemilînin. Mînak: Dibistanên havînê vekin û sê heyvên havînê bi kurdî helal, delal û zelal bikin. Çirûskekê bidin ber çirûskên din, findekê (mûmek) bidin ber mûmên din, stranekê bidin ber stranên din û bi wî awayî Kurdistana xwe di warê ziman de jî vejînin, temam û baştir bikin.

Mînak: Divê kurdê/a ku Mem û Zînê nizanibe xwe nepejirîne, xwe kêm bibîne. Kurdê/a ku çend riste ji Cegerxwîn û Tîrêj nizanibe divê bi şev xewnereşkan bibîne, xwe nebexşîne. Ku wiha be, dê her kurd; Mem û Zînê jî, Herîrî jî, beytên Feqî jî, stranên perwer û çiyayî jî zanibe û jiyana xwe û xwe bi xweşiktî, wêjetî û rengîniya ziman bixemilîne. Ma dengê ku bikare çend riste ji Cegerxwîn, çend pirtûkên kurdî bixwîne, çend stranên kurdî bixwîne û nexwîne dibe wek hev?

Ma zimanê ku serê sibê bêje roj baş û ya/yê ku bêje gunaydin dibe yek? Ma yê/ya ku di civatan de, di telefon û dawetan de bi kurdî biaxive û yê/ya ku bi tirkî biaxive dibe yek? Na, lewre jî divê her kurd xwe bi vî çavî jî analîz bike û nebesiyên xwe derbas bike.

Zanibe ku berevajiyê peyva yê/ya ku bi tirkî nizanibe bêziman e yê/ya ku kurdî nizanibe, hê jî nizanibe û hê jî xwe bes bibîne, xwe efû bike, bêziman e, bê Cîgerxwîn bê Mem û Zîn, bê Erebê Şemo, bê Bavê Nazê, bê Aydil- Aydil û Çiyayê Gebaro ye.

Loma jî divê em zimanê xwe xweş biaxivin, pirtûkên xwe yên ku her roj zêde dibin bixwînin û stranên xwe guhdarî bikin serfiraziya xwe ya hilbijartinê bi serfiraziya, ziman temam bikin. An na dê kêm bimîne, dê nîvcotî dest ji me bernede.

www.arsivakurd.org

**Petîxeke taybet**

Li her welatî fekî, sebze û nebatên cur bi cur şîn dibin. Yek ji wan jî cureyeke petixê ye. Weke petîxa kîwano tê binavkirin. Ev petîx zêde naşibe petîxên ku tên zanîn. Dendikên wê dişibin yên xiyaran. Hundirê wê jî kesk e. Tehma wê weke ya xiyaran e lê hinekî şîrîn e. Dendikên wê jî weke joleyê ye. **KUALA LUMPUR**





# Ji ber bendavê mexdûr bûne

**Bendavên ku li Kurdistanê tên çêkirin hem dîrokê tune dikin û hem jî gel mexdûr dikin. Şêniyên 18 gundên Kopê jî ji ber ku gundên wan di bin avê de mane perîşan bûne**

Bendava Alpaslan 1 ku di sala 1995'an de ji aliyê Karê Avê ya Dewletê ve (DSÎ) ve hatiye çêkirin û di sala 2008'an de jî dest bi faaliyetê kiriye 18 gundên bi ser navçeya Kopa Mûşê mexdûr dike. Dewletê gundên ku di bin avê de mane desteser kir lê pere neda gundiyan her wiha ji bo wan cihek jî nîşan neda. Gundiyan li hemberî vê yekê nerazîbûn nîşan dan û diyar kirin ku dewletê we mexdûr kirine.

Ji bo çêkirina Bendava Alpaslan 1 li navçeya Kopa Mûşê di sala 1995'an de xebat hate destpêkirin. Bendav di sala 2008'an de jî kete faaliyetê. 8 gund di bin avê de man.

Ji bilî van, gundên Qogak, Şehwelya, Kopo, Sahbarat, Xirbe, Hoşgeldî, Gulçîmen, Akroq, Şabelat û Arincikê jî ji ber xetereyê hatin valakirin. Gundiyên ku ji gundê xwe derketin hinek ji wan çûn li cem xizmên xwe yên li gundên derdorê. Lê hinek ji wan jî kon vedan û di konan de têkoşîna jiyanê didin. Bi bilindbûna ava bendavê dibistanên gund di bin avê de man. Bi sedan xwendekar bê dibistan man. Ji gundê Kopo jina bi navê Zahîde Oner (75) diyar kir ku 75 sal in li vir dijî lê mecbûr maye gundê xwe biterikîne. Oner wiha axivî: "Di bin navê enerjiyê de axa me di bin avê de hiştin."

Hevserê wê Ahmet Oner jî diyar kir ku jiyana wan serobino bûye û wiha got: "Ez li vir bang li hemû cîhanê dikim. Ev tişta ku AKP dike derveyî mirovahiyê ye. Ji gundiyên weke me çi dixwazin û hatin li ser axa me bendav ava kirin. Hem axa me desteser kirin hem jî pereyê me nadin. Di misilmaniyê de tiştekî wisa nîn e."

**Gundiyan ceza dikin**

Nîmet Karakayê jî got ku di hevdîtina bi rayedaran de rastî nêzikatiyên balkêş hatine û wiha axivî: "Me bi parlamenterê AKP Seracettîn Karayagiz û Qaymeqamê Kopê Fatîh Aksoy re hevdîtin pêk anîne lê encamek bi dest nexist. Alîkarî nedan me. Parlamenterê AKP'ê Seracettîn Karayagiz jî ji me re got dengê xwe bidin AKP'ê piştre em biaxivin. Em ji wan gotinan van tiştan fêm dikin ku ew me ceza dikin." Karakaya got ku gundî hatine mexdûrkirin û pereyên wan nadin wan û wiha berdewam kir: "Ji me re dibêjin gund vala bikin lê cihekî nîşanî me nadin. Em mexdûr bûne. Zeviyên me di bin avê de ma. Midûriyeta Bayindirlikê ya Dewletê metrekareya malan 268 TL diyar kiriye lê ji bo hin malan 80 TL didin. Ev nayê qebûlkirin. Bedela nirxên ku di bin avê de dihêlin nabe." Welatiyê bi navê Haşîm Işik jî diyar kir derdê dewletê ne ceryan e û wiha got: "Dewlet bi vî rengî dixwaze têkiliyên di navbera gel û PKK'ê de qut bike. Ne xema wan e ku em hatine mexdûrkirin. Qaymeqamê Kopê bi awayekî aşkera ji me re got 'heke hûn mirov bana em ê weke mirov nêzîkî we bana.' Ji ber ku me deng daye DTP'ê wisa dikin. Ew me bikujin jî rengên dengê me diyar e. Li navçeya Çerkez a Yozgatê ji ber bendavê cih dane welatiyan lê li vir me perîşna dikin." Endamê Meclîsa Giştî ya Bajar Arafat Karlidagli jî diyar kir ku feraseta dewleta civakê ji holê hatiye rakirin. Karlidagli got ku ew vê yekê qebûl nakin û ji bo ku gel mexdûr nebe dê vê yekê bişopînin. **MÛŞ**

# Li Heskîfê kolandinên arkeolojîk dest pê kir

Rektorê Zanîngeha Êlihê Prof. Dr. Abduselam Uluçam, diyar kir ku wan starta kolandina erdkolojiyê li Heskîfê dest pê kir û heta 15'ê cotmehê bidome. Uluçam, anî ziman ku ne pêkan e tevnê çandî yê Heskîfê biguhêzin û ev yek li dijî zagona xwezayê nirxand.

Zanîngeha Êlihê, der barê xebatên kolandina erdkolojiya Heskîfê de li Heskîfê civîna çapemeniyê li dar xist. Rektorê Zanîngeha Êlihê Prof. Dr. Abduselam Uluçam, diyar kir ku wan îro starta kolandinê dest pê kiriye û kolandina Heskîfê dê heta 15'ê cotmehê bidome. Uluçam, da zanîn ku wan îsal zû dest bi kolandinê kiriye û wiha got: "Beriya niha arkeolog ji zanîngehên derve dihatin. Ji zanîngehên Yuzuncu Yil û Selçukê dihatin. Li gorî perwerdehiya zanîngehan ji ber ku xebatên kolandinê çêdibûn em li benda dawiya salê diman. Niha arkeolog li Zanîngeha Êlihê peywirê dikin û êdî pirsgirêka çûn û hatinê tune. Êdî derfet û dema me zêde ye. Dê kolandin heta 15'ê cotmehê bidome."

Uluçam, li ser xebatê jî agahî dan û diyar kir ku dê 12 endamê hîndekariyê û 24 xwendekarên lîsansê xebatê bimeşînin. Li aliyê din nêzî 160 xwendekarê zanîngehên cuda serî li me dan. Uluçam, destnîşan kir ku dê nêzî 150 karkerî bidin xebitandin û wiha dom kir: "Dê kolandin li 4 deverên cuda bê kirin. Hin kolandin bi nîvî mane. Îsal em ê kolandina li ser wan dom bikin. Dîsa em ê li girekî nû dest bi kolandinê bikin. Yekem car li gorî xebatên rûyên erdê berhemên dema Neolotîk û dema Kevir derketin holê. Ev berhem û bermahiyên derkevin holê dê dîroka Heskîfê zelal bike."

Uluçam, da zanîn ku ku xwendekar ji Zanîngehên Selçûk, Ataturk, Gazî û Zanîngeha Wanê werin li vir xebata kolandinê bikin. Di destpêkê de em dê li ser Tirba Zeynel Beg dest bi kolondinê bikin. Ji bo kolandinê Wezîrê Çandê 1 mîlyonek û 240 hezar TL pere cûda kiriye. Midûriyeta DSÎ jî 495 hezar TL pere ji me re cûda kiriye. Uluçam destnîşan kir ku ne pêkan e berhem cih biguhêzin û anî ziman ku guheztina berhem û bermahiyan li dijî xwezayê ye. **ÊLIH**

# Licê di tariyê de ye

Li navçeya Licê ya Amedê ji ber lambeyên kuçeyan vênakevin, navçe bi şevê vedigere bajarekî tarî.

Navçeya Licê ku 12 hezar nifûsa wê heye, piştî roj hiltê di nav tariyê de dimîne. Li Lîcê ji ber ku lambeyên kolan û kuçeyan vênekevin, welatî di şevê de bi fenera destan dertên derve. Welatiyan diyar kirin ku rayedarên TEDAŞ'ê peywira xwe bi cih naynin. Welatiyan, destnîşan kirin ku dema bûyerên diziyê jî diqewmin pê nahesin. Welatiyan bang li rayedaran kirin ku peywira xwe bi cih bînin û pirsgirêka ceyranê çareser bikin.

Rayedarên TEDAŞ'ê ji îdia kirin ku ji ber hêza ceyranê di destê wan de hindik e lembeyên kolan û kuçeyan venakin û diyar kirin ku derfetên wan ên zêdekirina hêza ceyranê çêbibe, dê ceyrana kolan û taxan vekin. **AMED**

# Eleqeya ji bo cilên neteweyî zêde dibe



Li Colemêrgê bi germbûna hewayê re fîstan û kirasê jinan eleqeyeke mezin dibînin. Cihên ku kiras û fîstan didirûn ji ber zêdebûna sparîşan êdî di ber dirûtinê re nagihêjin.

Di serî de li Colemêrgê û li Şirnexê di rojên taybet de jin kiras û fîstanên herêmî li xwe dikin. Cilên herêmî ku wekî sembolek neteweyî tên dîtin, li herêmê gelekî bi qîmet tên dîtin. Kesên ku kincên ji modelên kadîfe, bi pul, çermê mar, tul, yê nexşandî, nîgar, qedîfeyê bi tul û modelên şoqdar û gelek cureyên cilên neteweyî didirûn û difiroşin, ji ber eleqeya zêde êdî di ber nagihêjin.

Xwediyê Kargeha Irmakê Songul Ateş, destnîşan kir ku di demên dawîn de cilên neteweyî eleqeyeke mezin dibînin. Ateş, anî ziman ku rojê 10 fîstanan çêdike û diyar kir ku fiyetê wan di navbera 15 û 60 TL'yan de li gorî qumaş diguhere. Ateş, derbirî ku bi zêdehî modelên, barzanî, modela Iraq û çerkez tên eciban-din. Ateş, bilêv kir ku cilên neteweyî ji bo jinên Celemêrgê bi taybetî jî di demên dawetan de di rêza yekem de ne.

Esnafê bi navê Tahîr Baş ku kincên herêmî difiroşe jî, destnîşan kir ku rojê nêzî 40 fîstanên fiyeta wan di navbera 50 û 300 TL'yan de diguhere difiroşe. Taş, têkildarî eleqeya ji bo cilên neteweyî wiha axivî: "Bi salan e ez vî karî dikim. Bi taybetî di dema despêka dawetan de eleqeya ji bo cil û bergên herêmî zêdetir dibe. Karê me di meha çile de disekine, lê bi hatina demsala havînê re dîsa dest pê dike." Taş, daxuyand ku turîst jî bi eleqeyeke mezin nêzî cil û bergên herêmî dibin û dikirin. **COLEMÊRG**

www.arsivakurdi.org